



Landeskommission  
Berlin gegen Gewalt

## FORMA ZANYARÎYÊ

Di vê forma zanyarîyên de tevî têçûyînên barkirinê di çarçoveya Fermana Tevdîrên Ewlehîya Avagerîyê de li ser proseya pêkanîna zanyarî hene û li ser pirsên pir tîn pirsîn bersivê tîn xuyandin.

### Ez di çarçoveya çi tevdîran de dikarim serî li fonê bixim?

Encûmena Eyaleta Berlîna ya Dijî Tundîyê ji bo van ên jêrîn xizmetên pereyî peydeyê dike:

- **Tevdîrên ewlehîya avagerîyê û**
- **têçûyînên barkirinê.**

### Ez li gora pîvanên serdanê me

1. Eger hûn di binê bandora tundîya xwedîya motîvasyonîn siyasî yê tînd yan a bi mebesta cudakarîyê, gefan û xeteran de bin nexwe hûn xwedanên pêdivîyan in.
2. Hûn dikarin wek kesekî bi serê xwe, dezgeheke bi awayê fermî naskirî ya dînî yan a xêrê ya bê berjewendî, komele yan tevgerî yan alîgirê wê serdana xwe pêşkêş bikin.

### Ez dikarim ji bo kîjan tevdîrên avagerîyê serî lê bidim?

Hûn dikarin ji bo tevdîrên avagerîyê yê ewlehîyê yê jêrîn çareyên pereyî bi dest bixin:

1. li dijî dizîyê derîyên ewle
2. li dijî dizîyê pencereyên ewle û derîyên bi pencere (derîyên sefikê û yê banî);
3. li dijî dizîyê panjurên/derabeyên ewle;
4. ji bo pencereyan û derîyên bi pencere filmên nayên qulkin ên nahêlin dizî bibe;
5. arasteyên bi mebesta ewlehîyê yê wek ji bo pencereyan û derîyan milên pencereyan ên bi kilît, silindîrên profîlan, qabên ewle, kilîtên veşartî
6. zengên ketina bê destûr ên bi qabloyan bê tîl ên dizîyê;
7. kamerayên bi qabloyan bê tîl ên çavdêrîyê û
8. yê din.

## **Ez dikarim ji bo çi têçûyînên barkirinê serî lê bidim?**

---

1. Hûn dikarin di çarçoveya şîrketên bazirganîya barkirinê yan alîkarên taybet de ji bo alavên malê fona barkirinê bi dest bixin.
2. Gava we bar kir hûn dikarin herî pir ji bo zemanekî sê mehî peredayînên herî kêrêm yan ji bo kirîya cot serî lê bixin.
3. Haya we jê hebe ku çûna ji bo dîtinê, destmizên navgînan, têçûyînên nûkirinê yê ji bo xesarên gava barkirinê rû dan, tor, eger bivê veşartina mobîlyayan, tevdîrên bi mebesta nûkarîyê û ciwankarîyê, xwarin û vexwarinê ji alîkaran re bê dayîn yan bexşîş nayên destekkirin.
4. Dibe bedeleke sabit a barkirinê jî bê dayîn. Ev miqdar ji bo kesî zewicandî 1,639 € ye lê; ji bo dêûbavekî bi tenê, dêûbavekî berdayî yan bîyan û ên bi serê xwe dijîn 820 € ye. Ji bo her kesekî bêtir î li heman malê dijî tevî vê hûn dikarin serdana ji bo 361 € jî bikin.

## **Ez dikarim çi qas alîkarîya pereyî wergirim?**

---

1. Hûn dikarin herî pir ji bo foneke bi miqdarekî 50,000 € serî lê bixin. Di rewşa biegerkirî û îstîsnaî de dibe ji miqdareke bêtir re jî bê erêkirin.
2. Ji bîr nekin ku mafêke we yî hîqûqî ji bo dayîna alîkarîya pereyî tune ye. Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê, eger di budceyê de foneke têr hebe, dê li gora biryara xwe bixwe ya berpîrsîyarîyê biryar bide.

## **Ez ji ku derê dikarim forma serdanê bi dest bixim, divê bi çi awayî pêşkêş bikim?**

---

1. Hûn dikarin ji rûpela înternetê ya Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê formê peya bikin: <http://www.berlin.de/lb/lkbgg/> yan ji vê navnîşana nameya elektronîk bixwazin: [berlin-gegen-gewalt@seninnds.de](mailto:berlin-gegen-gewalt@seninnds.de).
2. Ji kerema xwe di çarçoveya fona alîkarîyê de serdana xwe ya nivîskî bişînin vê navnîşanê:  
  
Landeskommission Berlin gegen Gewalt  
c/o Senatsverwaltung für Inneres und Sport,  
Klosterstraße 47,  
10179 Berlin
3. Ji bîr nekin ku piştî ku hemû belgeyên serdanê hatin pêşkêşkirin dê dest bi karpêkirina serdana we bê kirin. Pêkanîna rastderxistinê jî tê de ye.

## **Divê ez bi serdanê re rastderxistineke çawa pêk bînim?**

---

Ji kerema xwe bi serdanê re van belgeyên jêrîn jî pêşkêş bikin:

1. Ji şîrketêke bazirganîyê ya barkirinê ya firmayên pîspor ên di tevdîrên ewlehîyê yê avagerîyê de erêkirî derxistina nîrxên sê meh di rewacê de bin, yan eger alîkarên taybet bi kar bînin listeya liserrûniştinê.
2. Ji Beşa Polîsê Berlînê şîreta ewlehîya teknîk yan; ji nivîsîngeheke pîspor a şîretkarîyê ya ji bo qurbanîyan û li gora standardên peyderkirina şîretkarîyê ji bo qurbanîyan û li dijî cudakarîyê têdikoşe, nîrxandineke li ser gefan û xeteran.
3. Ji bo tevdîrên ewlehîyê yê avagerîyê ji alî kirêkirî ve erêkirina nivîskî, yan rastderxistina xwedîtiyê û eger lihevhatî be ji meqamê têkildar ê parastina abîdeyan.
4. Rastderxistina belgeyên ku rewşên fotografên xesarê, danzanînên şahidan, dosyekirina gilîkirinan, nivîsîna nameyên elektronîk û dîmenên ekranên posteyan filan eşkere dikin.
5. Eger barkirinek rû bide belgeyên li ser cîhê rûniştinê yan cîhê karkirinê.

### Rastderxistinên pêvekî yê ji bo dezgehên, komeleyan, rahîjkarên filan

1. Nîsxeya rêbaznameyê/qanûnî
2. Derhatiya/ekstrakta tomara komeleyê/bazirganîyê
3. Nîsxeya erêkirina awayê mebesta karnekirinê/danzanîna îstîsnayê
4. Ji bo nûnertîyê forma çapkirî ya palpişt bi lihevkerinê

## **Divê ez ji bo nîrxdanîyê hay ji çî hebim?**

---

1. Berî serdanê divê hûn ji sê qubalegirên cîhê sê nîrxên nivîskî bixwazin.
2. Hay jê hebin ku her sê nîrxderxistinên xwastî heta mumkin be taybet û girêder bin.
3. Bi şîretî, şîrketê barkirinê yan alîkarên taybet re li ser di gava pêkanîna vê tevdîrê de hemû malîyetên dibin derkevin bidin û bistînin. Ev divê, ji ber ku miqdarê fona bê erêkirin, dê bi palpiştê nîrxdanîna têkildar a pêşkêşkirî ve be. Dê di xuyandina miqdarê de ji nîrxdanîna herî maqûl re bê erêkirin.

## Divê ez hay ji çi tiştê şirketên erêkirî yê tevdîra ewlehîyê yê avagerîyê hebim?

---

1. Ji bo pêkanîna tevdîrê, ji bîr nekin ku şirketeke di teknolôgîya ewlehîya mekanîk de pispor a li gora pêdivîyên teknolôgîya ewlehîya Beşa Polîsê Berlînê tevdîrên ewlehîya avegerîyê saz bike divê.
2. Beşa polîsê Berlînê, rastîya navnîşanên yê ku alavên ewlehîyê bi hev dixin her tim dinirxîne. Hûn dikarin ji vê navnîşanê xwe bigihîninê:  
<https://www.berlin.de/polizei/aufgaben/praevention/diebstahl-und-einbruch/artikel.125021.php>  
Tevdîrên ewlehîyê yê van standardan pêk neynin nikarin ewlehîya bivê pêk bînin.

## Divê ez rastîya rewaca xeter û gefên cudakarîyê bi awayekî çawa binirxînim?

---

Ji bîr nekin ku hûn dikarin bi nirxandineke li ser xeter û gefên cudakarîyê yê ji alî nivîsîngeheke şîretkarîyê ya di beşa xwe de pispor, yan ji Beşa Polîsê Berlînê kirina şîreteke teknîk a ewlehîyê rewayîya gef yan xeterê rast derxînin.

1. Eger hûn biryar bidin ku xeter yan risk ji alî Beşa Polîsê Berlînê ve bê xuyandin, ji bo şîreta ewlehîya teknîk zanyarîyên têkilîkirina bi navendê re li jêrê ne:

Der Polizeipräsident in Berlin

Landeskriminalamt Koordinierungsstelle Staatsschutz (LKA Ko St)

Nameya elektronîk: LKAKoordinationSt@polizei.berlin.de

2. Eger hûn ji bo nirxandina xeter û gefên cudakarîyê nivîsîngeheke şîretkarîyê ya pispor bibijêrin, divê hûn nivîsîngeheke ji bo qurbanan û têkoşîna bi cudakarîyê li gora standardên rêberîyê tevdigere bibînin. Hûn dikarin xwe ji rûpela Nivîsîngeha Eyaletê ya li Dijî Cudakarîyê Wekhevî (LADS)ê ji bilî jêderên din, xwe bigihînin nivîsîngehên pispor ên şîretkarîyê yê van pîvanên başbûnê bi cîh tînin: <https://www.berlin.de/sen/lads/beratung/diskriminierung/> yan ji rûpela Antidiskriminierungsverband Deutschland (advd)ê xwe bigihîninê: <https://www.antidiskriminierung.org/>. Hûn dikarin di sîteya înternetê ya LADSê de rêbereke li ser şîretkaran bibînin û advd "dîtereke şîretkaran" pêşkêş dike <https://www.antidiskriminierung.org/betroffene>. Li vê derê digel nivîsîngehên şîretkarîyê, ji bo qurbanîyan û ji bo têkoşîna bi cudakarîyê re li ser standardên pêkanîna xizmetê zanyarîya bêtir bibînin:

## Divê ez li ser milken kirêkirî û bikirêdayî bi çi tiştan bizanim?

---

1. Divê hûn ji bo tevdîra ewlehîya avagerîyê ji aliyê bikirêdayî desthilatdariyekê bistînin;
2. Ji kerema xwe bi aliyê kirêkir re bidin û bistînin ka dê tevdîra ewlehîya avegerîya hûn ê serî lê bixin, gava hûn ji milkî derbîkevin dê were derxistin yan neye derxistin û tevdîr di miqdarê kirêyê de bibe sebebê bêtirbûnê yan na. Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê van xizmetan destek nake!
3. Ji bilî van, ji bîr nekin ku ji tevdîrên ewlehîyê yê avagerîyê yê avahîyên xwedîyên statuya abîdeyan re ji meqamên parastina abîdeyan ên têkildar destûr divê.

4. Gava we kamerayên çavdêrîyê bar kirin, hûn berpîrsîyar in hûn baş bizanin ka ew bi rêzikên heyî yê ewlehîya daneyan re lihevhatî ye yan na. Digel fermanên qanûnî yê tamamkir ên federal û eyaletê, nexasim Ferma Qanûnî ya Parastina Tevahîya Daneyan (GDPR) di nav vê de ye.

### **Divê ez di mijara zengilên dizîyê de hay ji çi hebim?**

---

1. Eger hûn sazkirina zengila dizîyê hilbijêrin, bi pêlkirina bişkoka zengê dê karibe gazî alîkarîyê bê kirin. Di vê rewşê de Beşa Polîsê Berlînê salix dide ku bere zengilê bê dayîn şîrketê ewlehîyê ya erêkirî yan navenda veguhestinê ya Beşa Polîsê Berlînê. Bi her awayî ji bo bidûketina mehane pere tê sitandin.
2. Ji kerema xwe ji bîr nekin ku hûn ê ji pereyê bidûketinê berpîrsîyar bin. Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê bedela xizmeta bidûketinê nade!

### **Divê ez ji bo fatoreyan hay ji çi hebim?**

---

Divê di fatoreyan de zanyarîyên jêrîn hebin:

1. Nav û navnîşana mişterîyî û qubalegirî (şîrketa pispor a erêkirî yan şîrketa barkirinê yan alîkarên taybet)
2. Nav û navnîşana mişterîyî (kesê ku ji bo têçûyînên barkirinê yan pêkanîna tevdîrên ewlehîyê yê avagerî yan pêkanîna wan destûr daye yan bi kar anîye).
3. Tarîxa nivîsîna fatoreyê
4. Lîsteya xizmetê, nav û têdeyîya wê
5. Jimara bacê ya pêkînerê xizmetê yan jimara nasnameya baca îzafî
6. Jimara rêzika fatoreyê
7. Zemanê pêkhatina xizmetê
8. Miqdarê baca îzafî
9. Di fatoreyên ji bo xizmetan nivîsandî de (wek nimûne telafî): referansa baca îzafî yan referansa serbestîya ji bacê ("Yekûn, li gora § 19 para. 1 UStG baca îzafî naxe nava xwe").
10. Jimara procektê yan referansaşîrketê (GKZ - bnh. belgeya li ser alîkarîyan)

## Min divê ez li ser parastina daneyan bi çi zanibim?

---

1. Ji bo hûn serdana têçûyînên barkirinê yan tevdîrên ewlehîyê yên avagerî bixin rewacê ji me re zanyarîyên we yên kesî divên. Encûmene Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê ji bo li ser serdana we biryarekê bide jê re ev zanayîr divê. Eger neye erêkirin dê ji xizmetên pereyî re jî neyên erêkirin.
2. Zanyarîyên we yên kesî li gora biryarên endamên Meclisa Nûneran a Berlînê, berî ku bîn dosyekirin her tim tîn şifrekirin, yanî zanyarîyên we yên kesî nayên belavkirin. Ev zanyarî, ji alî meqamê çavdêrîyê ve li gora asta giringîyê eger çavdêrîyek bê kirin jî şifrekirî ne.
3. Alîkarîyên ji bo kesên hikmî yanî birêxistinên bê mebesta karkirinê û komeleyan bi tenê eger ew di jêrdaneyên-trans de qeydkirî bin û di jêrzemîna daneyan a alîkarîyê de destûra belavkirina zanyarîyên jêrîn dabin û di çarçoveya qaydeyên budceya eyaleta Berlînê de dibe ji wan re bê erêkirin: nav, navnîşana posteyê, mebesta alîkarîyê, yekûn û cûr. Ji ber ku belavkirina navan û navnîşanên posteyên elektronîk dikarin bibin sebebê gefan û xeteran, li gora feydeya tevahî ya bidestketina zanyarîyên feydeya parastinê girantir e û ji ber vî sebebî em xwe ji li jêrzanîna alîkarîyê tevlîkirina navan û posteyên elektronîk xwe dûr dikin. (bnh. AV no. 1.5.2 - § 44 LHO). Yanî alîkarîyên bîn kirin, dê nikarin heta komeleya yan dezgeha we bîn taqîbkirin.
4. Alîkarî bi tenê dê ji alîyên serbest, demokratîk û pergala qanûnên esasî qebûl dikin re bê kirin. Li gora Têçûyînên Barkirinê û Fermana Tevdîrên Ewlehîyê yên Avagerî Fiqreya 2yê jimara 4ê eger nîşanên erênekirin ji wan re bivên hebin, em mecbûr in zanyarîyên we yên kesî ji bo nixandina sebebên erênekirinê bişînin Beşa Polîsê Berlînê. We divê hûn ji veguhestina van daneyan re destûrê bidin, eger na, em nikarin serdanê bixin rewacê û nikarin ji hîç alîkarîyekî re jî erê bikin.

## Ji kerema xwe van ên jêrîn ji bîr nekin:

---

1. Tevlî îsbatê **serdana orîjînal** bişînin Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê
2. **Li hêviyê bin** ku Encûmena Eyaleta Berlînê li ser mijarê **biryarê bide**.
3. Bi tenê **piştî dayîna biryara alîkarîyê hun dikarin** tevdîrê pêk bînin yan bi cîh bînin.
4. Piştî xuyandina biryarê **tevdîrê demildest** pêk bînin.
5. Piştî **encamdayîna tevdîrê demildest fatoreya orîjînal** pêşkêşî Encûmena Eyaleta Berlînê ya li dijî Tundîyê bikin. Ji bo tevdîrên di sala budceyê ya 2021î de pêkhatî, we divê hûn fatoreyê herî dereng heta tarîxa 30/11/2021î pêşkêş bikin.
6. Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê dê **fatoreya orîjînal** di destê xwe de bihêle.
7. Ji bîr nekin ku Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê **bêtirî miqdarê di biryara alîkarîyê de xuyandî** pere li paş venagerîne.
8. Ji bîr nekin ku Encûmena Eyaleta Berlînê ya li Dijî Tundîyê, gava di nav du hefteyan de lipaşvergerandina pereyan mumkin be, mecbûr e **ji ser yekûna fatoreyê ji sedî dido kêmkirina peredayîna pêşîn bikuje**.